## «خەوە بەردینە»

لە چەشنی گەرووی کەو،
کەوی دۆمی یەخسیری زیندانی داری،
پڕی سەوزە بەستەی خرۆشانی باڕی
تەرەی باوەشی تاسەباری بناری
شەپۆلی لە گوێن خوێنی شەرمی کچانە
لە سەر ڕوومەتی ماتی بووکی ڕەزاسووک
بەتینی بتاوێنێ ڕوانینی زاوا
گەرمتر لە پڕشنگی تاوی بەهاری
وەکوو نەرمە هەنگاوی لاوی بەرەو ژوان
لە جێ ژوانی زیندوو بە گیانی کچی جوان
وەکوو گەرمە یاوی قەشەی دەستی تاراو
لە بژوێنی دەریای بلوورینی بەروێ
بە خوڕ خۆ بە دیواری کێوا ئەدا ئاو
لەگەڵ گاشە بەردا سەر ئەسوێ سەر ئەسوێ.

IIIIIIIII

کچی نوور قەتیسی دەسی دێوی کێوە
لە ئەنگوستە چاوی دڵی خێوی کێوا
بەرەو دەر، بەرەو شارە دەریا بەڕێوە.
گەرووی ویشک و چاوی سپی چاوەکانی
دەرووی ڕوونی ئاوە
بە فانۆسی ئەستێرە بەرچاوی ڕوونە
لە بەر پێی حەریری کەوەی سێوەرە
بە پۆی مانگە شەو چندراوە.
ئەڵێی بورجی خاپووری مێژووی لەمێژین
لە درزی هەزار خشتی ڕۆژ و شەوانی
دڵۆپەی چپەی پۆلی پەریانی دادا
ئەڵێی پێکەنینی کچی سەرگوریشتەی قەدیمی
لە ئەندامی تاپۆی وەکوو بوومەلێڵی
سنووری شەوی دوێنێ ئەوڕۆی بەیانی

پەچەی قورسی نسیانی ئینسانی لادا.
IIIIIIIIIII
ئەڵێی دەنگی شمشاڵە ڕەشماڵی دۆڵی دڕیوە
شەماڵی دەرەی دوورە شاری
پشووی پڕ لە عەتری بەهاری کچی کورد
بە بلوێری شووشی گەرووی زەرد و زۆڵی
لە زەنوێری زێو ئاژنی سای زرینگانەوەی شەو
بە خوڕ زەمزەمەی هەڵبڕیوە
بە ئیعجازی ئەنگوستی پاکی موحەممەد
شەتی نوور بە ڕووی مانگی عەرزا کشاوە
تروسکەی برووسکەی شەوی دەم بەهاری بە هەورە
لە سەر عاسمانی زەوی ڕاخوشاوە.
لە هەر گاز و ڕێبازێ وا گازی ئاوی ئەگاتێ
نیازی هەزاران گەزیزەی بەنازی وەدی دێ
ئەبووژێتەوە داری چاکی بە ودمی هەناسەی
شنەی نەرمە لاوێنی دەم بای ئەخاتێ.
IIIIIIIIIII
ئەڵێن تاجی زمرووتی دوورگەی لەسەر ناوە دەریا
هەتا چاو هەتەر کا، شەپۆلە، شەپۆلە
لە بوونا لە چوونا
بە ئاهەنگە سەربەندی بزوێنی خۆشی
لەبەر خۆرە تاوا ئەڵێی سینگی ژینە ئاهاژێ
ئەڵێی: هانی هەستانە دەنگی خرۆشی
سروودی خوناوەی بەهارە لە گوێما
لە هەر شێوە جۆبارێ هەر دەشتە چۆمێ
لە دڵمایە بڕوای بەرینی بە دەریا گەیشتن
لە تاریکە تاراوگەکەم وا بەسەر چوو
زەمانی تەریکیم
ئیتر خێر و خۆشی لە ڕێما

IIIIIIIIIII

وەهایە :
کە کانی بە هیوا
بەهارانە لووزەو ئەبەستن بەرەو شاری دەریا
بەڵام داخی جەرگم لە گەڵ هەر بەهارێ
کە ڕائەچڵەکن سەوزەڵانی
لە خاکینە خەونی گرانا
لە دڵما خەم و داخی ئەم دەردە سەوزە:
کە دەردی گرانی هەموو ڕێبوارێ وەنەوزە
IIIIIIIIIII
لەبەر نووری خۆرا
گەلێ کوێرەکانی شەوارەن
زنەی دمم بە هاواری هاری درۆزن هەزارن
کە تەسلیمی سیحر و تەلیسمی بنارن
بەبێ هەوڵی هەڵدان و چارانی چارن
بە هیوان بگرمێنێ هەوری بەهاری
ڕەهابن
لە زیندانی بەردینی غارا.
کەچی ، وا کەوی و دەستەمۆی دەستەڵاتی ڕکەی دۆڵ و شێون
لەبەر سامی ڕێ وا بەزیو و تەزیون
لە گەڵ گۆچی کردن گزنگێ،
چەواشەن لە پێچی نزارا.
IIIIIIIIIII
هەتا بیری تاڵی گڕاوێ
بەدڵما گەڕاوە
هەتا یاد ئەکەم ئاوە بەو ورمە بەردینە کاری کراوە
ئەڵێم سەد مخابن
وەجاخێ کە ڕووگەی هەزاران نزای شینە باهۆی بەتاسەن
وەبووژێنەوەی هەست و هان و هەناسەن
چلۆنە کە بیژووی گڕاوان ئەبینن

لە نێو چاوی ئەو خانەدانە
لەهی چۆنە پیتی بڕاوە؟
نە سۆزەی بلاوێنی میری، خوناوەی بەهاری
نە تووکی برای ڕێبواری
لە کاسی خەوا، فێری ڕاسانی ناکەن
لە مانا، بە ئامان و بریا
پەشیمانی هەرمانی ناکەن
وەها گەی لەشی بەو گە بەردینە گاوی دراوە
کەحێلێکە، کۆڕژن و حیلەی نەماوە
وەهایە کە هەر گیایە لەو دەشتە شینن
لە سەر ماتەمی ئاوە بەردینە، سەرشین و سەرگەرمی شینن

||||||||||||

گەلێ گۆلە لەو چۆلە یەخسیری خاکن
بە ڕوویا گەڵا وەک چەمۆڵەی کڵۆڵی وەریون
گەمارۆی زەلی نێزە، وا تەنگی پێ هەڵچنیون،
کە بێ دەرفەتی پێکەنینن بە سەد بەرزگی زەردە ماسی
لق و پۆپ و هەشگەڵ
وەها دەور و پشتی تەنیون
کە بێ فرسەتی چاوەبڕکێ
لە گەڵ عەڕشی پاکن

||||||||||||

هەتا جۆگە ئاوێ بە وشکی دەبینم
ئەڵێی مێرگی ڕوخساری کیژێکی کاڵ و مناڵە
بە کووزی تەمەن جاڕە جوانێکی پڕ خەوش و خاڵە،
تەشەندارە جەرگی برینم.
بەڵێ: دوورە گەرمێنی دەریا
بەڵێ: وایە کانی هەژارن
ئەزانم

ئەوانەی کە پاراوی ئاون بژارن.
ئەزانم لە ڕێگا،
مەترسی گەلێ ژەنگ و ژارن.
بەڵام کاکە ئەو گشتە عەقڵی خەسارن
لەناو ئەو هەموو ئاوە هەر چاوەیەک
باوی هەنگاوی خۆشە
بە تەنیا ئەوە شارەزای کۆسپ و کەندالّی ڕێ یە
هەوەڵ مەنزڵی زێ یە، ئاواتی بەرزی زرێ یە
ئەزانێ لە هەڵدێرە هانی بەهێزی
لە ئەسکوند و چاڵایە هەڵدان و گێژی
پەڕۆی شینی سەرشانی دەریایە ژینی کەرێزی
ئەزانێ لەپێ ناکەوێ پێ یە پێڵاوی تاسەی پیاسەی لەپێ بێ
نەوەستان دەوەستێ بە دەستێ
کە خاراوی ئیش و سواوی سوێ بێ
لەهەر شوێنێ ڕاماوە، داماوە، کاری تەواوە
ئەزانێ ئەبێ هەر بژی و باژوێ، تا بژی تا بمێنێ
هەناوی بە هەنگاوە، نەسرەوتنە کوولەکەی ڕووحی ئاوە.

IIIIIIIIIII

## Xewe berdîne

**Le çeşnî gerûy kew,**
**Kewî domî yexsîrî zîndanî darî,**
**Pi’rî sewze bestey xiroşanî ba’rî**
**Terey baweşî tasebarî binarî**
**Şepolî le gwên xwênî şermî kiçane**
**Le ser ’rûmetî matî bûkî ’rezasûk**
**Be tînî bitawênî ’rwanînî zawa**
**Gerimtir le pi’rşingî tawî beharî**
**Wekû nerme hengawî lawî berew jwan**
**Le cê jwanî zîndû be giyanî kiçî cwan**
**Wekû germe yawî qeşey destî taraw**
**Le bijwênî deriyaî bilûrînî berwê**

**Be xu’r xo be dîwarî kêwa eda aw**
**Le ge’l gaşe berda ser eswê ser eswê.**

ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ

**kiçî nûr qetîsî desî dêwî kêwe**
**Le enguste çawî di’lî xêwî kêwa**
**Berew der, berew şarî derya be’rêwe .**
**Gerûy wîşk u çawî sipî çawekanî**
**Derûy ’rûnî awe**
**Be fanosî estêre ber çawî ’rûne**
**Le ber pêy herîrî kewey sêwe’re**
**Be poy mange şew çindirawe .**
**E’lêy burcî xapûrî mêjûy lemêjîn**
**Le dirzî hezar xiştî ’roj u şewanî**
**Di’lopey çipey polî periyanî dada**
**E’lêy pêkenînî kiçî serguriştey qedîmî**
**Le endamî tapoy wekû bûmelê’lî**
**Sinûrî şewî dwênê ew’roy beyanî**
**Peçey qursî nisiyanî însanî lada  .**

ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ

**E’lêyî dengî şimşa’le ’reşma’lî do’lî di’rîwe**
**Şema’lî derey dûre şarî**
**pişûy pi’r le ’aetirî beharî kiçî kurd**
**be bilwêrî şûşî gerûy zerd u zo’lî**
**Le zinwêrî zêw ajinî say zirînganewey şew**
**Be xu’r zemzemey he’lbi’rîwe**
**Be ê’acazî engustî pakî muhemmed**
**şetî nûr be ’rûy mangî ’aerza  kişawe**
**tirûskey birûskey şewî dem beharî be hewre**
**le ser asimanî zewî ’raxuşawe.**
**Le her gaz u ’rêbazê wa gazî awî egatê**
**Nyazî hezaran gezîzey benazî wedî dê**
**Ebûjêtewe darî çakî be widmî henasey**
**Şiney nerme lawênî dem bay exatê**

ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ

**E’lêy tacî zim’rûtî du’rgey leser nawe derya**
**Heta çaw heter ka, şepole , şepole**
**Le bûna le çûna**
**Be ahenge serbendî bizwênî xoşî**
**Le ber xoretawa e’lêy sîngî jîne ehajê**
**E’lêy: hanî hestane dengî xiroşî**
**Sirûdî xwnawey behare le gwêma**
**Le her şîwe cobarê her deşte çomê**
**Le di’lmaye bi’rway berînî  be derya geyiştin**
**Le tarîke tarwgekem wa beser çû**
**zemanî terîkîm**
**îtir xêr u xoşî le ’rêma.**

ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ

**Wehaye :**
**Ke kanî be hîwa**
**Beharane lûzew ebestin berew şarî derya**
**Be’lam daxî cergim le ge’l her beharê**
**Ke ’raeç’lekin sewze’lanî**
**Le xakîne xewnî girana**
**Le di’lma xem u daxî em derde sewze:**
**Ke derdî giranî hemû ’rêbwarê wenewze.**

ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ

**Le ber nûrî xora**
**Gelê kwêre kanî şewaren**
**Ziney dem behwarî harî dirozin hezarin**
**Ke teslîmî sî’hr u teslîmî binarin**
**Be bê hew’lî he’ldan u çaranî çarin**
**Behîwan bigirmênê hewrî beharî**
**’Reahabin**
**Le zîndanî berdînî ’xara .**
**Keçî, wa kewî u destemoy deste’latî ’rikey do’l u şîwin**
**Le ber samî ’rê wa bezîw u tezîwin**
**Le ge’l goçî kirdin gizingê,**
**Çewaşen le pêçî nizara .**

ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ

**Hata bîrî ta'lî gi'rawê**
**Be di'lma ge'rawe**
**Heta yad ekem awe bew wirme berdîne karî kirawe**
**E'lêm sed mixabin**
**Wicaxê ke rûgey hezaran nizay şîne bahoy betasen**
**Webûjênewey hest u han u henasen**
**Çilone ke bîjûy gi'rawan ebînin**
**Le nêw çawî ew xanedane**
**Lehî çone pîtî bi'rawe?**
**Ne sozey bilawênî mîrî, xunawey beharî**
**Ne tûkî biray 'rêbiwarî**
**Le kasî xewa, fêrî 'rasanî naken**
**Peşîmanî hermanî naken**
**Weha gey leşî bew ge berdîne gawî kirawe**
**Ke'hêlêke, ko'rijn u 'hiley nemawe**
**Wehaye ke her giyaye lew deşte şînin**
**Le ser matemî awe berdîne, serşîn u sergermî şînin**

**ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ**

**Gelê gole lew çole yexsîrî xakin**
**Be 'rûya ge'la wek çemo'ley ki'lo'lî werîwin**
**Gemaroy zelî nêze, wa tengî pê he'lçinîwin,**
**Ke bê derfetî pêkenînin be sed berzigî zerde masî**
**Liq u pop u heşge'l**
**Weha dewr u piştî tenîwin**
**Ke bê firsetî çawebi'rkê**
**Le ge'l ''ae'rşî pakin**

**ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ**

**Heta coge awê be wişkî debînim**
**E'lêy mêrgî 'ruxsarî kîjêkî ka'l u mina'le**
**Be kûzî temen ca're cwanêkî pi'r xewş u xa'le**
**Teşendare cergî birînim**
**Be'lê :dûre germênî be derya geiyştin**
**Be'lê: waye kanî hejarin**
**Ezanim**
**Ewaney ke parawî awin bijarin .**
**Ezanim le 'rêga,**
**Metirsî gelê jeng u jarin**

**Be’lam kake ew gişte eq’lî xesarin**
**Le naw ew hemû awe her çaweyek**
**Bawî hengawî xoşe**
**Be tenya ewe şarezaî kosp u kenda’lî ’rêye**
**Hewe’l menzi’lî zêye, awatî berzî zirêye**
**Ezanê le he’ldêre hanî behêzî**
**Le eskund u ça’laye he’ldan u gêjî**
**Pe’roy şînî serşanî deryaye jinî kerêzî**
**Ezanê le pê nakewê pêye pê’lawî tasey piyasey le pê bê**
**Newestan dewestê be destê**
**Ke xarawî îş u swawî swê bê**
**Le her şwênê ’ramawe, damawe, karî tewawe**
**Ezanê ebê her bijî u bajiwê, ta bijî ta bimênê**
**Henawî be hengawe, nesrewtine kûlekey ’rû’hî awe**

ĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨĨ